# Kurdish Monitoring

Platforma Çavdêriyê û Rapornivîsînê ya Mafê Bikaranîna Kurdî

## Rapora Binpêkirinên Mafê Bikaranîna Ziman û Çanda Kurdî li Tirkiyeyê

## Kanûna Paşiyê - Sibat - Adar 2025

Q X W

KURDISH MONITORING

2025

# Derbarê Kurdish Monitoringê de

Kurdish Monitoring, ji bo li Tirkiyeyê binpêkirinên birêkûpêk ên li dijî ziman û çanda Kurdî pêk tên bişopîne, tomar bike û bi raporan wan bi raya giştî re par ve bike ava bûye û înîsîyatîfeke serbixwe ya. Platform li gorî prensîba ku dibêje pirrengiya ziman, mafekî bingehîn ê mirovan e tevdigere û li gorî vê prensîbê jî dixwaze astengiyên di qada civakî de li pêş Kurdî derdikevin raber bike, daneyan derbarê van binpêkirinan de amade bike û bi vî rengî mafparêziyê bike.

**Kar û Bar û Armancên Platformê**

**1. Berhevkirina Datayan**

Wê çavkaniyên ji raya giştî re vekirî (dokumanên fermî, biryarên dadgehan, medyaya herêmî û netewî) bişopînin û bûyerên binpêkirinê tomar bikin.

Wê hevkariyê bi saziyên civaka sivîl, parêzer û mexdûran re bike û daneyan ji qadê berhev bikin.

**2. Rapornivîsîn**

**Raporên Birêkûpêk:** Wê her ji sê û şeş mehan û salê carekê raporên berfireh amade bikin.

**Raporên Demkî:** Di rewşên awarte de yan jî dema pêşketinên gelekî girîng pêk hatin, wê bi lez û bez raporên demkî amade bikin.

**3. Mafparêzî**

Raporan wê ji saziyên mafên mirovan ên netewî û navnetewî re bişînin.

Bi şaredariyan, partiyên siyasî û medyayê re wê hevkariyê bike û hewl bide ku di mijara binpêkirinên mafê bikaranîna ziman de baldarî çêbibe.

**4. Hevkarî**

**Civaka Sivîl:** Rêxistinên mafparêz, aktivîstên zimanparêziyê, akademîsyen.

**Medya:** Çapemeniya herêmî û netewî, rojnamegerên serbixwe.

**Saziyên Navnetewî:** Raportorên Taybet ên NYyê, Konseya Ewropayê.

**Raya Giştî:** Civaka Kurdan û parazvanên mafên zimanan ên li Tirkiyeyê.

**Armanca sereke**

Armanca Kurdish Monitoringê ew e ku Kurdî li Tirkiyeyê bi Destûra Bingehîn bêparastin, li qada civakî bi rengekî azad bê bikaranîn û mîrateya wê ya çandî were parastin. Di wê baweriyê de ye ku pirzimanî yek ji hîmên esasî yên demokrasiyê ye. Ji bo siberojeke ku binpêkirinên mafan tê de nebin, bi datayan dixwaze baldariyê çêbike.

## Rewşa Heyî ya Mafên Bikaranîna Zimanê Kurdî li Tirkiyeyê

**Kurdî li Tirkiyeyê rastî astengiyên yasayî û fiîlî tê**

**Mafê Perwerdeyê:** Mafê perwerdeyê bi zimanê zikmakî nîne. Bi tenê bi dersên bijarte û bi vekirina saziyên perwerdeyê yên taybet tê sînordarkirin. Hejmareke gelekî kêm hîndekarên Kurdî tayîn dikin.

**Çand û Huner:** Şano, konser û berhemên edebî kêfî tên qedexekirin, hunermend dibin hedef.

**Medya û Ragihandin:** Rojname, kovar û hesabên medyaya civakî yên saziyên medyayê yên bi Kurdî weşanê dikin tên sansurkirin, tên astengkirin.

**Qada Civakî:** Tabela yan jî nivîsên hişyariyê yên şaredariyan tên jêbirin; stran û govenda Kurdî weke "sûc" tên qebûlkirin.

Dema parlamenter li Parlamentoyê bi Kurdî diaxivin, dengên wan tên birîn, li şûna gotinên wan ên bi kurdî, gotina "zimanekî nayê zanîn" tê nivîsandin. Li nexweşxaneyan, li cihên kar û yên mîna wan, axavtinên bi Kurdî tên astengkirin.

**Girtîgeh:** Nahêlin girtî bi Kurdî xeber bidin, dest datînin li ser name û pirtûkên wan ên bi Kurdî. Yên bi israr Kurdî bikar tînin, tên cezakirin (qedexeya hevdîtinan, qedexeya şandin û wergirtina nameyan û axaftina bi telefonê û yên mîna wan).

Ev tiştên ku tên kirin, ne li gorî Peymana Mafên Sivîlan û yên Siyasî ya Neteweyên Yekgirtî (Xala 27an) û Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (Xala 10an) û yên din in ku Tirkiye ew peyman îmze kirine.

# Rapora Binpêkirinên Mafê Bikaranîna Ziman û Çanda Kurdî li Tirkiyeyê


## Kanûna Paşiyê - Sibat - Adar 2025

# Astengiyên li ber Kurdî, di qada civakî de berdewam dikin

Li gorî vê rapora ku **Kurdish Monitoring - Platforma Çavdêriyê û Raporniviîsînê ya li Mafê Bikaranîna Kurdî** amade kiriye, di her sê mehên destpêkê (Kanûna Paşiyê, Sibat, Adar) ên sala 2025an de, li Dada civakî, medya, qada çand û hunerê û li girtîgehan 24 caran mafên bikaranîna kurdî hatine astengkirin. Kurdish Monitoring, çavdêriyê li mafê bikaranîna Kurdî dike û ji bo civakê agahdar bike raporan amade dike. Ev bûyerên navborî, zext û zordariya di jiyana civakî de li Kurdî dibin, careke din nîşan didin.

**Li gorî kategoriyan bûyerên ku pêk hatine:**

- Qada Civakî: 5
- Medya: 8
- Çand-Huner: 7
- Girtîgeh: 4




Astengiyên li ber Kurdi, di gada civaki de berdewam dikin (Sê Mehên 2025)

Li gorî rapora sê mehên borî, herî zêde di medyayê û qada çand û hunerê de mat hatine binpêkirin. Malper û hesabên medyaya civakî yên Ajansa Mezopotamyayê, Jinnewsê û saziyên din ên medyayê hatin astegkirin. Piraniya caran malperên Tirkî yên van ajansan tên astengkirin lê di heman demê de ev biryar bandorê li beşên wan ên Kurdî jî dikin. Her weha zext û zordarî li hunermend û akademisyenên Kurd jî bûn.

**Detay:**

- Li Civaka Giştî ya Parlamentoyê gotina "Jin Jiyan Azadî" di zabitnameyan de nehrte nivîsîn.
- Pankartên bi Kurdî hatin qedexekirin an jî bi darê zorê daxistin.
- Ji ber ku stranên bi Kurdî strane, stranbêjên Kurd hatin cezakirin.
- Li girtîgehan axavtin û sandin û wergirtina nameyan a bi Kurdî hate qedexekirin.
- Hesabên Kurdî yên saziyên medyayê yên medyaya civakî hatin girtin. Bi giştî ev binpêkirin jî nîşan didin ku hebûna Kurdî a li qada civakî bi rengekî sîstematîk di bin zextan de ye.

# Qada Civakî

**Kanûna Paşiyê**

- Parlamentera DEM Partiyê Meral Daniş Beştayê diyar kir ku li dibistaneke navîn a li navçeya Karaçobanê ya Erzeromê, formên ji bo dersên bijarte hatine amadekirin, bi zanyariyên kêm hatine amadekirin û mafê bijartina dersên Kurmancî, Zazakî û zimanên din tên astengkirin.

**Adar**

- Li Zanîngeha Teknîkê ya Gebzeyê, komeke jinan a ji 20 kesin pêk hatiye, xwest ji bo 8ê Adarê Roja Jinan meşekê li dar bixe. Rêveberiya dibistanê ji ber sedema ku wê jin “bi Kurdî sloganan berz bikin” û dowîzên bi kurdî hilgirin” jin asten kirin.

- Parlamentera DEM Partiyê Gulderen Varli dema li Civata Giştî ya Parlamentoyê diaxivî, behsa Jîna Emîniyê kir. Dema ku wê, navê Jîna Emîniyê bilêv kir, ji rêvebiriya Parlamentoyê heye ku wê ew bi Kurdî biaxive û dengê Varliyê qut kir. Her weha di zabitnameyên Parlamentoyê de gotina “Jin Jiyan Azadî” nehate nivîsandin.

- Alîgirên tîma Amedsporê ji bo maça Sakaryasporê pankartek amade kir ku li ser wê bi Tirkî û Kurdî nivîsa “Ew ê te tune bihesibînin lê tu yê her wext hebî” hatibû nivîsandin. Ji ber ku Kurdî jî tê de heye, pankart hate qedexekirin. Paşê krîz çareser bû û pankart hate daliqandin.

- Piştî ku Şaredarê Bajarê Mezin ê Stenbolê Ekrem İmamoğlu hate desteserkirin, li Konyayê di dema çalakiyekekê de, xortekî pankarteke bi Kurdî bilind kir. Lî çalakgeran bertek nîşan da û pankart daxistin.

# Medya

**Kanûna Paşiyê**

- Hesabê Ajansa Mezopotamyayê yê Xê (Twitter), yên JINNEWS û Yeni Yaşamê hatin astengkirin. MAyê hesabekî nû vekir, lê ew jî hate astengkirin.

**Sibat**

- Dadweriya 2yem a Aştî û Cezayî ya Semsûrê bi hinceta “parastina ewlehiya netewî û pergala civakî” malpera Ajansa Mezopotamyayê asteng kir.
- Hesabên MA û Jinnewsê yên Xê hatin astengkirin.
- Bi heman hincetê malpera Kurdî ya Dengê Amerîkayê (Voice of America) hate astengkirin.
- Dadweriya 6em a Aştî û Cezayî ya Enqereyê hesabê YouTube, X û Instagramê yên rojnameger Abdurrahman Gokî asteng kirin.
- Hesabê Jinnews’in yê Xyê yê Kurî (@jinnewskurd) hate astengkirin.=
- Hesabê Jinnewsê û Xwebûnê yê Xê hatin astengkirin.
- Pêşkeşkara Sözcü TVyê Serap Belovacıklı, Kurdiya nameya Rêberê PKKyê Abdûllah Ocalan a 27ê Sibatê de hate xwendin ne weşand. Dema  Ahmet Türk name bi Kurdî xwend, Belovacıklı got, ”Dema bi Tirkî, zimanê fermî yê di nava sînorê Komara Tirkiyeyê de tê bikaranîn bixwînin, em ê bînin ser ekranê.” Belovacıklıyê sansura li ser Kurdî bi van gotinan parast: “Ji ber kes bi Kurdî fam nake, em nadin.” Habertürk TV û NTVyê jî Kurdiya heman daxuyaniyê neweşandin.

# Çand - Huner

**Kanûna Paşiyê**

- Polîsan li Amedê bi ser avahiya Komeleya Wêjekarên Kurd de girt û dest danîn li ser 150 pirtûk û hazar û 500 nisxeyên rojnameyan.
- Ji ber ku di dersên xwe de helbestên bi Kurdî dane xwendin, rêveberiya Zanîngeha Mûş Alparslanê lêpirsîn li akademîsyenekî beşa Ziman û Wêjeya Kurdî vekir. Pirtûkên ku bûne sedema lêpirsîn li akademîsyenî vebe, bi destûra Wezareta Çandê hatine çapkirin ku ya Fatma Savciyê ku Weşanên Avestayê çap kiriye, ya Arjen Arî ku Weşanên Sorê çap kiriye û ya Cegerxwîn ku Weşanên Lîsê çap kiriye.
- Ji ber sê stranên bi Kurdî li Qers û Çanakkaleyê strane, 30 meh cezayê girtîgehê li hunermend Kasim Taşdogan birîn.

**Sibat**

- Hunermend Seyda Perînçek dema xwest ji bo konserekê biçe Japonyayê, li sînor hate desteserkirin û dersînorkirin. Li gorî îdiayan Konsolxaneya Tirkiyeyê daxwaza betalkirina konserê li rayedarên Japonyayê kiriye.
- Polîsan li navçeya Konakê ya Îzmîrê bi ser saziya Jîn Art Sanatê de girt. Kamerayên ewlekariyê metal kirin, dest danîn li ser pirtûk û komputeran, ala Tirkan li ser texte xêz kirin.
- Piştî ku 22 meh û 15 roj cezayê girtîgehê li stranbêj Mazlûm Akpolat hatibû birîn, hate erêkirin, Akpolat hate girtin. Ji ber straneke Kurdî ev ceza li Akpolat hatibû birîn.
- Ji ber pirtûka "Hînker"ê ya perwerteya Kurdî, nivîskar Mevlüt Aykoç, Sami Tan, Ronahî Önen û Sadık Varlı hatin desteserkirin. Her weha, ji ber ku fotografên wan di pirtûkê de hene, İzzet Çınar û Şükriye Çinar jî desteler kirin. Aykoç, Tan, Öner û İzzet Çınar tevî Şükriye Çınarê bi şertê kontrola edlî serbest bûn. Varlı bêyî kontrola edli serbest bû.

# Girtîgeh

**Kanûna Paşiyê**

- Salim Güranê ji ber dosyaya kuştina keça bi navê Narin Güranê hatibû girtin, dema li Girtîgeha Hejmar 1ê ya Ewlehiya Bilind a Erzeromê bi rêya telefonê bi malbata xwe re bi Kurdî axiviye, hatiye astengkirin.
- Pirtûkên bi Kurdî nedane girtiyên li Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Kirşehîrê.

**Sibat**

- Li Girtîgeha Jinan a Erzînganê nameyên bi Kurdî 4-5 megan didin sekinandin û paşê didin girtiyan.
- Li Girtîgeha Hejmar 1ê ya Ewlehiya Bilind a Elezîzê, pirtûkên bi Kurdî û nameyan nadin girtiyan.